(46)emîn salvegera şewata sînemeya Amûdê

Selah Bedredîn

Li Qamişlo,bawer dikim di pola yekem paş navendî de bûm,di dibistana Urûbe a navdar de ku heta niha jî heye,û di eynî wext de ,ez endamê Komîteya rêxistina Partiya Demoqrata Kurdistanê di nav xwendekaran de bûm,angu komîteya berpirsiyara dibistan û xwendekaran.

Roja 13/11/1960 karesata sînemeya Şehrezad li Amûdê çêbû,me bi şev bihîst ku bûyerek li Amûdê qewimî ye,roja 14-ê mehê, em sibehê zû hatin xwendingehê ,min ew hevalê xwe yê di komîteya berpisa xwendekaran ya partiyê de hevdû bi lez dît û me got dive ku em biçin Amûdê,û alîkariya xelkê lêqewimî bikin.

Li xwendingehên Qamişlo wê çaxê-niha jî-çavdêr hebûn,çavdêr helbet ji aliyê alavên ewlekariyê ve dihatin destnîşankirin,belam di eynî wext de mamoste bûn ,hingê Hisên Hecî Hisên çavdêrê me bû(piştre bû parêzger paşê jî bû wezîr)girêdayî saziyên ewlakariyê bû.Ez û du hevalan em çûne nik wî da ku rêdanê jê bixwazin,me got ku merivên me li Amûdê hene dive ku em herin wir,lê me dît ku ew dizane ku bûyer qewimî ye,û hîç bibandor nebûye .Hisên ji me re got nabe hun biçin,qedexe ye û divê hun dewama xwe bidomînin,lê me biryar da û em çûne Amûdê.Sibehê em gihiştine wir ,bihna goştê biraştî ji Amûdê dihat,paşê em çûne sînemeya wê bi sedan û bi hezaran xelk hebûn,term û cendekên zarokên şewitandî diguhastin û dibirin mizgev û malên mezin da ku dê û bav zarokên xwe binasin,em du rojan li wir man ji ber ku di rojekê de veguhastin bidawî nebû.

Birêz Fûad jî behs kir aspektên teknîkî yên bûyerê û yên din,em pêwîst dibînin awireke siyasî li meselê binerin angu ew rûdan anjî karesat di çi rewşên siyasî de pêkhat?Bê guman çi tiştê bi serê milletê Kurd tê berê û nuha herdem şik û guman li dora wê çê dibin ku ji encama pilanakeke regezperestî be, ev şik ji aliyê kurdan ve herdem heye ji ber ku Kurd milletekî bindest û sitembar e,dijmin bê ewle ye û pilanên wî yên şovonist hene ,bi rastî jî ji ber vê yekê herdem guman heye lê em bêbextiyê li tukesî nakin divê em bidin diyarkirin di çi rewşeke siyasî Kurdî û Sûrî de ew rûdan qewimî.

Di wî wextî de weke tê xuyakirin, destpêka danîna pilanên şovonist li dijî milletê Kurd dihatine amade kirin ji ber çi gelo?Wî wextî Partiya Demoqrata Kurdistanê li Sûriyê hebû heta sala 60 jî navê hizb Partiya Demoqrata Kurdistanê-Sûriyê bû ,di bernameya wê madeya yekê dibêje:yek ji armancên Partiya Demoqrata Kurdistanê-Sûriyê rizgarkirin û yekkirina Kurdistana mezin e.Helbet Partiya Demoqrat yeka neteweyî bû diyare ku bandora Xoybûnê li ser raman û ideoljiyaya wê hebû,vî tiştî şovonistên ereb ditirsandin bi rastî,berî ku Partî Demoqratî Kurdistan çêbibe,li nav komelgeha Kurdî de partiya Komunist û Birayên Misilman hebûn-Bessî hebûn lê kêmebûn -lê ,eger wekû jimar mirov bibêje berî partiya Demoqrata Kurdistanê, Komunist serdest bûn di gorepana Kurdî de.Piştî Partiya Demoqrata Kurdistanê çêbû bi rengekî modern û hevdem û bi progiramekî diyar û zelal, piraniya kurdan li dora wê civiyan,û bîreweriyeke neteweyî bi germî û bi xurtî pêkhat di wî wextî de.Di heman demê de,weke em tev dizanin Barzaniyê nemir vegeriya Iraqê,şoreşa Temûzê çêbû,û em herdem jî dibêjin ji ber meseleya cografî û rûhî tevgera siyasiya Kurd li Sûriyê gelekî bibandor e ta îroj jî bi Kurdistana Iraqê ku wekû navendeke neteweyî tê hijmartin û dîtin, vegera Barzaniyê nemir û vêketina şoreşa Temûzê jî bandoreke mezin di vî warî de kir. Her weha, tirseke mezin ji şovoniyên ereb li Sûriyê re peyde kir tevî tirsa ji hişmendiya neteweyî a ku me got ku bi germî û xurtî wê demê hate pedeykirin.Di wê çaxê de,şovonist ramiyan ku wexta dewleta Sûriyê

azad bûye Kurd ne di destûr û ne di yasayê de nehatine bibîranîn û hatiye inkarkirin lê em temaşe dikin ku tevgera Kurd jinûve destpê dike,ramiyan çareseriyekê bikin vêce di wê demê de xwe amade kirin hin pilanên taze deynin ji bo rê li ber tevgera siyasiya Kurdî bigirin.Di wê çaxê de,diyar bû weke mînak wezîrê derve Sûriyê Esed Mehasin daxuyaniyeke zor xeter da wekî agahdariyekê ,tê de dibêje diyar e dewleteke Kurdî li Cezîrê çê dibe,Kurd ji Tirkiyê bi dizî hatine û li Cezîrê bi cî bûne,dixwazin kiyanekî Kurdî li wir ava bikin.yek ji wan agahiyên ku di wî wextî de berî sala 1960î,piştre yekî din hebû şovonist û neteweperest bi navê Seîd Seyd wî jî rojane daxuyanî didan û di rojnameyên Sûrî de agahî belav dikirin û digot biveyeke Kurdî heye.

Bê guman e ko ,li her welatekî di navbera kesayetî û hêzên siyasî de rikeberî heye,her yek servekirinan dike, tiştekî wiha jî li nav jîngehên şovonist li Sûriyê wê çaxê hebû,ev hemî bi hev re bûne sedema ku hindek pilanên taze li dijî tevgera siyasiya kurdî werine danîn.Ew pilan rengekî parastinî,ewlekarî,siyasî û rewşenbîrî hebû ,weke diyar e Mihemmed Teleb Hîlal hingê xerîk bû rapora xwe dirust bike,Mihemmed Telb Hîlal di sala 1961ê de rapora xwe tewaw kir angu,berî wê demê,di salên 1959an de destpê kiribû heta ku sala 1961ê hate çapkirin û bi nehênî hate belavkirin,tekez e ko Hîlal ne jiberxwe ve ev tişt kir,ew hatibû teklîfkirin bi rengekî fermî ko lêkolînekê bike bi taybetî li herêma Cezîrê derbarê pirsên mirovî,civakî û cografîk dîrokî…htd,ji ber ku wan bi hûrbînî danûsitendin bi pirsgirêkê re kirin,piştî wê, wî lêkolîna xwe derxist a ku bû nimûneya şovonistên Sûriyê û bûye weke destûrê şovonistan û ew heta niha jî li ser wê rêçikê ne.

Di heman demê de,sebaretî pirs ewlekarî û parastinê,kêşeya Kurd bû beşek ji pirsa ewlekariyê,ne pirseke siyasî ko divê di riya istixbarat û alavên ewlekariyê de bête çareserkirin û destpêka vê proseya hanê avakirina-Mekteb Tanî-(nivîsîngeha diwemîn),di wextê Ebdelihemîd Serrac de bû dema yekîtî di navbera Sûriyê û Misirê de çêbû,sala 1958an ,-Mekteb Tanî- pir dijwar bû yetkiyên wê zehf bûn,gelek tiştên mîna êşkencekirinê ne tenê li dijî kurdan lê li dijî ereban jî (mirovê ereb Ferecellah Hilû li ser destê Mekteb Tanî bi esîdê hate helandin) angu -Mekteb Tanî-dest bi karê xwe kir wekû nimûne efserekî gelek navdar kolonel Hikmet Mînê bû berpirsê -Mekteb Tanî- li Qamişlo,gava ku sînemeya Amûdê hate şewitandin Hikmet Mînê li Qamişlo bû , Kurd gelek di wê demê de ji navê Hikmet Mînê ditirsiyan û dema navê wî dihat gotin xelek dilerzîn.Reşîd ê Kurd jî mirovekê neteweperest û komunist û çepger lê giring ew Kurd bû wê demê hate girtin û êşkencekirin di wextê Hikmet Mînê de,ew li kerê siwar kirin û tiştê seyr anîne serê wî.Her weha,Hikmet Mînê hewil da ku di navbera êlên Kurd û ereban de fitneyan peyde bike bi taybet Şimmer û Tey heta ku hindek bûyer di navbera êlên Kurdan û Şimmeran de pêkhatin jî,û niha zarokên Dehamê Hadî xeric in hindek agahiyên taze anjî veşartî eşkere bikin ko ew rûdanên wê demê ji ber fitne û pilanên ewlekariyê bûn.Gelek xebatkarên Kurd ji ber destên -Mekteb Tanî- reviyan û hindek ji wan penaberî Kurdistana Iraqê jî bûn-Cegerxwîn yek ji wan bû-.Diyar bû wê çaxê li nik -Mekteb Tanî-reaksiyonynek çêbû nexasime ji layê Ebdilhemîd Serrac ê ko hewilda ku Partiya Demoqrata Kurdistanê-Sûrî bixe bin hembêza xwe de lê serkirdayetiya Partî qebûl nekir û li ber xwe da heta ew di salên 60 û 61an de hatine girtin jî,lê weke me got serokatiya partiyê ev tişt bi piranî retkir û daxwaza Cemal Ebdilnasir hebû ko Kurdan bike dostê xwe li hemberî Tirkiyê û hevpeymana–Sento-,ji ber ku Nasir bi rengekî stratîcîk li pirsgirêkê temaşe dikir lê zebaniyên wî li Sûriyê bi rengekî din pirs birêve dibirin,û serokatiya partiyê qebûl nekir bikeve bin baskên-Mekteb Tanî-de,ew reaskiyon bû ji ber wê jî sedemek hebû ku bihtir kurdan bi êşînin,çavên wan bişkînin,û teedê li wan bikin.

Divê bê gotin ku,-Mekteb Tanî- karîbû di wî wextî de cara yekê girûp in Kurdî bixe bin

hembêza xwe de,ta niha ew girûp berdewam in lê bi rengekî dinê,wê çaxê şepolek ji Partiya Demoqrata Kurdistanê-Sûriyê girtin,helbet şepoleke kêm û piçûk bû û bê bandor bû lê şepola din weke Nûredîn Zaza û Osman Sebrî ew nifşê berî me bi mêranî û mêrxasî li hemberî van pilanan rawestiyan lê şepolek di nava tegvera siyasiya Kurd de peyde bû heta niha berdewam e ji wî wextî despê kir.

Pilaneke din jî ew bû ku melayên ereb dianîn û ji dêvla melayên Kurd li Cezîrê bicî dikirin,tê bîra min melayekî ereb wê demê anîne gundê me Cummayê jî,û roja hat bi erebî axift paş ku çû xelkê got me tiştek jê fam nekir!û hikûmetê çîrokbêj jî dişandin deverên Kurdnişîn bi armanca belavkirina zimanê erebî ev tev di wextê -Mekteb Tanî-de bû ,fişar li zimanê Kurdî dikirin û li şêxên kurdan jî.Di warê hunerî de jî,Ûsivê Çelebî wê demê hebû tembûrvanekî bi nav û deng bû,bi jehirê mir tê gotin ku -Mekteb Tanî-li paş bûyerê bû.

Di bin saya van rewşên siyasî û ewlakarî yên behskirî,karesata Amûdê pêkhat.angu,pirsgirêk ne teknîkî anjî qezaûqeder bû,armanca sereke ya vê rûdana diltezîn şovonist û regezperestî bû, dixwestin ku çavên milletê Kurd bişkînin û sûtandina 300 zarokî û weke wan birîndar ne hijmareke kêm e di wê qonaxê de,tevî mixabin,ko ti belge û dukument di nav destên me de tune ne!Dibe ku gumana me ko pilaneke şovonist li paş bûyerê heye ji ber rûdanên din ko piştre hatine qewimandinê.wekû mînak 24ê Avdara 1993an,li bendîxaneya Hesekê 2 zinadan ku 60 kesên Kurd tê de bûn û hatine şewitandin,5 kes teklîf kiribûn piştî hefteykê her pênc wekû tawanbaran bidarvekirin,helbet ew ji aliyê ewlekariya serbazî ve hatibûn teklîfkirin.Sedemê bûyerê jî nakokiyek di navbera du girûpan de li Dirbêsiyê pêkhatibû yek ji wan kurdên bazrigan in û a din jî Suryanî bûn û têkiliyên wan yên taybet bi lîwa Mihemmed Mensûre re ko niha efserekî mezin e di ewlekariya Sûriyê de û berê berpirsê ewlakariya Qamişlo bû.Diyar bû ku Mensûre dixwest di riya şewitandina bendîxaneyê de tola dostên xwe vegire!

Bûyera din jî ko gumana me pirtir dike ew fitneya ko hewil didan pêkbînin li Qamişlo sala 2004an, tevî ku rabûna milletê Kurd bi mêranî û berxwedana wî a bêhempa pilan li xwediyên wê vegerand.Helbet, kurdan weke hercarî qurbanî dan dora 40 mirovî hate şehîdkirin û bi sedan birîndar û bi hezaran girtî û penaber ku hindek ji wan anuha li vir hazir in.Ev jî destê Mensûre têde hebû.

Tiştê din jî terorkirina şêx Maşûqê Xiznewî mirovê olperest û neteweperest û dûrî alavên ewlakarî û istixbaratan bû tiştê ko bû sedema pilana kuştina wî were danîn,Angu ev hersê bûyerên navbirî dihêle gumana me derbarê karesta Amûdê zêde bibe ko bi heman mentalîteyê hate qewimandin.

Piştî amadekirina dadgeha navneteweyî a taybet bi doza Herîrî, hinek Kurd anuha belge û dukementan berhev dikin bi armanca girêdana dadgeheke navneteweyî anjî dema guherîn li Sûriyê pêk were dadgeheke Sûrî dikare van pirsan tevan bersiv bide,û sizayê bide bi tawanbarên van bûyer û rûdanên navhatî wan bikin.

Hêjayî gotinê ye ko, --Mekteb Tanî--karîbû di wê çaxê de cara yekem girûpên Kurdî bixe bin hembêza xwe de heta niha jî ew girûp berdewam in lê